# Polîtîkaya Ewlehîya Zarokan

**KOMELEYA BERÎ HER TIŞTÎ ZAROK**

**AMED, 2024**

**NAVEROK**

**DESTPÊK** .......... 3

**1.1. Em Kî Ne?** .......... 3

**2. Pênase-Referans li Qanûna Navneteweyî** .......... 4

**2.2. Îhmal û Îstîsmara Zarokan** .......... 5

**2.3.Tundîya li Zarokan Dibe** .......... 5

**2.4. Parastina Zarokan** .......... 6

**2.5.Beşdarîya Zarokan** .......... 6

**2.7. Rewşa Başîya Zarokan** .......... 7

**4.Polîtîka** .......... 8

**5. Çarçoveya Naverokê** .......... 8

**6. Prosedurên Parastinê û Pêşîbir** .......... 8

**6.1. Berpirsîyarî** .......... 8

**6.2. Kesê Baldar** .......... 9

**6.3. Standina Karî** .......... 9

**6.4. Polîtîkaya Kirînê** .......... 9

**6.5. Parastina Agahîyên Zarokan** .......... 9

**7. Têkilî û Xuyabûn** .......... 9

**8. Mekanîzmaya Agahdarkirinê** .......... 9

**9. Çavkanî** .......... 11

**10. Belgeyên Pêvek** .......... 12

**10.2. Ji Bo Zarokan Forma Erêkirinê** .......... 14

**10.3. Ji Bo Mezinan Forma Erêkirinê** .......... 15

## DESTPÊK

### 1. Di Derbarê Dezgehê da

#### 1.1.Em Kî Ne?

**Komeleya Berî Her Tiştî Zarok**, di sala 2017an da, bi mebesta ku di çarçoveya Peymana Mafên Zarokan da li ser pêşketina psîko-civakî, çandî-hunerî û pêşketina zimanî, derûnî û bedenî ya zarokan lêkolînan bike û piştgirîyê bide kes û dezgehên ku li ser vê mijarê dixebitin, li Amedê ava bû. Komele, armanc dike ku di warê çand û hunerê da li ser tema û mijarên cuda projeyan bimeşîne, bi beşdarî û pêşengîya zarokan berheman çêbike û van berheman bi rêya platformên medyayê bigihîne zarokan.

Xebatên **Komeleya Berî Her Tiştî Zarokê** li gor temayên wekî mafên zarokan, wekhevîya zayendî, çand û huner, ekolojî û zanist û teknolojîyê bişekl dibin. Komele, di çarçoveya van babetan da xwedîyê çar qadên xebatê ye

**Produksîyon**

Komele ji bo ku bigihîje armancên xwe, li ser mijarên cuda projeyan çêdike û ji bo zarokan berheman hildiberîne. Di nav van berheman da fîlmên anîmasyon, ragihandinên xizmeta giştî û bernameyên televîzyonê hene. Komele, herweha armanc dike ku materyalên nivîskî yên wekî pirtûkên çîrokan yên biwêne û bideng ji bo zarokan çap bike.

**Lêkolîn**

Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, li ser mijarên li gor armanca xwe û bi armancên xwe ra pêwendîdar lêkolînan dike û daneyên xwe bi formatên wekî rapor û belgefîlman bi raya giştî ra parve dike.

**Perwerdehî**

Komele, bi taybetî li ser mijarên ku li jor hatine gotin, ji bo zarokan atolyeyan/kargehan li dar dixe. Di van kargehan da zarok bi zimanê xwe yê dayikê, ji lêkolînên li ser mijarên cihê sûdê werdigirin. Di van waran da xwe bi pêş ve dibin û zanîn û azmûna hilberînê bi dest dixin. Zarokên jêhatî yên ku dixwazin di van waran da perwerdehîya xwe bidomînin tên destekkirin.

**Bernameyên Dezhehî**

Komele ji bo zarok, dêûbav, mamosta û kesên ji pîşeyên din yên ku bi zarokan ra li ser mijarên li gor armanca xwe dixebite; fealîyetên wekî sempozyûm, konferans, panel, atolye û semîneran organîze dike.

#### 1.2. Ji Bo Çi Divê Em Polîtîkaya Parastina Zarokan Geş bikin?

Polîtîkayên parastina zarokan armanc dikin ku zarokan ji îstîsmar, îhmal û mameleya xerab biparêzin. Ev polîtîka li berpirsîya civakê ya li hember zarokan, dabînkirina jîngeheka ewle û piştgirîkirina geşedana bi tendurist ya zarokan hûr dibe. Herweha mafên zarokan diparêze û

destwerdana zû û mekanîzmayên piştgirîyê ava dike. Armanca van polîtîkayan xwe dispêre Peymana Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî û ji çar prensîbên bingehîn pêk tê: Berjewendîya herî baş ya zarokan, mafê jîyan û pêşketinê, parastina ji cudaxwazîyê, avakirina jîngeheka ewle û ji metirsîyan dûr ji bo zarokan û beşdarbûna mijarên ku wan têkîldar dikin.

Pêwîst e em pêkanînên xwe yên ku di warê ewlekarîya zarokan da xeternak in biguherînin û dîskûra xwe bi vê perspektîfê, li gor mafên zarokan saz bikin. Ev, metneka wisa ye ku ji bo geşbûnê amade ye. Li gor bertekan dikare biguhere.

**1.3. Em Li bendê ne ku Polîtîka Kîjan Pirsgirêkan Çareser Bike?**

Belgeya Polîtîkaya Parastina Beşdarî û Ewlekarîya Zarokan; Armanc dike ku zarok û mezinên ku bi zarokan ra kar dikin hişyarîya xwe ya di derbarê mafên zarokan da zêde bikin, şîyana zarokan û xwedîlêderketina li mijarên ku zarokan eleqedar dikin bihêz bikin û rêxistinên din yên ku bi zarokan ra di warê mafên zarokan da kar dikin xurt bikin. Belavkirina belgeyên polîtîkayê bi hînkirina mafên zarokan dikarin berî her tiştî rê li ber binpêkirinên mafên mirovan yên muhtemel bigirin. Ew dikare ji zarokan ra bibe alîkar ku bi awayekê aktîf beşdarî mekanîzmayên biryargirtinê bibin li şûna ku li ser mijarên ku wan eleqedar dikin ne xwedî gotin bin.

## 2. Pênase- Referans li Qanûna Navneteweyî

Sîyaseta parastina zarokan berjewendîyên herî baş yên zarokan dixwaze. Lêbelê ji demên kevnar heta rabirdûya nêz cih, rewş û hebûna zarokan têra xwe nehatine nîqaşkirin. “Zaroktî, di serdema kevnar da ne têgeheka wisa bû ku balê dikişîne û xizmet ji welatîyên baş ra, di peymanên navneteweyî da ewlekarî û pêwendîyên xizimtîyê ra dikirin.” (Karakuş Öztürk, 2017, s. 255). Di vê serdemê da zarok wekî “welatîyên biçûk” tên dîtin ku divê di çarçoveya zagon û çanda civakê da bêne perwerdekirin. Di Serdema Navîn da bingeha sazûmana malbatê li ser îdeolojîya koletîyê hatîye avakirin û malbat tê wateya civateka ku ji kole û zarokên bav pêk tê. Di vê civatê da her mafê bav li ser zarokan heye û zarok ne xwedî statuyeka taybetî ne û ne jî mafên wan yên parastinê hene. (Uğur: 2018).

Bi Ronesansê ra, ku destûr da kifşkirina nirxê ferd, wateya zaroktîyê diguhere. Nêrîna ku zarok "hebûneka bêguneh" e ku ji jîyana mezinan cuda ye belav dibe, zaroktî wekî qonaxeka jîyanê ji mezinbûnê tê veqetandin û tê payîn ku ew bigihîje jîyana mezinan (Demir Gürdal, 2013). Lê, ev pêşveçûn ne bes in ku zarok bi tevahî bêne parastin.

Li gor maddeya 67/1-c ya Qanûna Cezaya ya Tirkan ya bi hejmara 5237an, kesê ku 18 salîya xwe temam dike bi zarokî tê pênasekirin. (Qanûna Cezaya Tirkan, Rojnameya Fermî, hejmar: 25611, 12 Çirîya Pêşîn, 2004) Li gor maddeya 3/1-a ya Qanûna Parastina Zarokan ya bi hejmara 5395an, di temenekê zûtir da kamil bibe jî, kesê ku hejdeh salîya xwe temam kirîye, zarok e (Qanûna Parastina Zarokan, Rojnameya Fermî, hejmar: 25876, 15 Tîrmeh, 2005) Li gor van hikman, her kesê ku temenê wî negihîştîye hejdehan wekî zarok tê pênasekirin û eger berî hejdeh salîyê jî kamil bibe jî ew zarok tê hesibandin.

### 2.1. Karkerîya Zarokan

Rêxistina Xebata Navneteweyî (ILO) karkerîya zarokan wekî wan karan pênase dike ku gelek caran rê li ber zarokan digire ku zarokatîya xwe bijîn, potansîyel û rûmeta wan kêm dikin û ji

bo pêşketina bedenî û derûnî zirarê dide wan. Karkerîya zarokan zarokan dike kole, ji malbatên wan vediqetîne, wan dixe ber xeter û nexweşîyên giran û wan neçar dike ku di temenên pir biçûk da li kolanên bajarên mezin debara xwe bikin.
Bersiva pirsa zarok divê çima bêne parastin mirov dikare li gor rapora ICHILDê ya bi navê "Karê Zarokan Çi ye?" bide: Li gor Raporê (2021); bikaranîna zarokan ya di çalakîyên neqanûnî da yên wekî hilberîna naveroka pornografîk yan hilberîna narkotîkê di berdêla bazirganî û deynê bazirganî da; Karên herî xirab in ku zirarê didin pêşveçûn, tenduristî û ewlehîya zarokan. Li gor mevzûata kar ya Tirkîyeyê, xebitandina zarokên ji 15 salî biçûktir qedexe ye. Zarokên ji 15 salî mezintir dikarin bixebitin eger bikarin pêşveçûn û perwerdehîya xwe ya derûnî, laşî, civakî û exlaqî bidomînin.

Karkerîya zarokan di zarokan da dibe sedema hin pirsgirêkên fîzyolojîk, derûnî û civakî. Sektor û awayê xebatê çi dibe bila bibe, bi xetereyan ra rû bi rû dimînin. Karên ku ew dikin û cihê xebatê ji hêla fîzyolojîk û psîkolojîk ve metirsîdar in ji ber ku ew ne li gor temen û asta pêşketina wan in. Tenduristîya wan zarokan xera dibe ku marûzî maddeyên xeternak û hewadarîya kêm û kîmyewîyan dimînin. Rewşên wekî zemînên şemitokî, nêrdewanên bêparastin û ronahîya kêm dibe sedem ku zarok li cihen kar xwe ne ewle his bikin.

### 2.2. Îhmal û Îstîsmara Zarokan

Mameleya Xirab, ji alîyê Rêxistina Tenduristîya Cîhanê ve bi çar awayan tê pênasekirin: îstismara fîzîkî, hestyarî, zayendî û îhmalkirin (Rapora WHO, 1999: 13-17). Rêlibergirtina reftarên wekî destdirêjîyê, bikaranîna hêza fizîkî ya biqestî ku li dijî zarokê tê bikaranîn, kişandina zarok ya nava tevgereka zayendî ya ku ew ji bo asta pêşveçûna wî guncaw e, tehdîtkirin, tirsandin û heqaretkirin bi Peymana Mafên Mirovan ya Neteweyên Yekbûyî hatîye garantîkirin. Îstîsmara zarokan, di çarçoveya berpirsîyarî, ewlehî û pêwendîyên hêzê da hemû zirara rastîn yan potansîyel li tenduristî, jîyan, pêşketin û rûmeta zarokan; her cure destdirêjîya laşî û/yan hestyarî; îstîsmara zayendî, îhmalkirin û mameleya xerab û îstismara bazirganî dihundirîne. (Rapora WHO, 2006). Ji alîyê din ve, kes û/yan sazîyên berpirsên lênêrîn û parastina mafên zarokan eger mafên wekî tenduristî, perwerde, xurek, stargeh û lîstikê kêm bihêlin ev tê maneya îhmalê. Qanûn û peymanên navneteweyî berpirsîyar in ku sîyasetên ji bo parastina zarokan hilberînin ku wan ji metirsîya îhmalkirin û destdirêjîyê biparêzin û sûcdaran ceza bikin.

### 2.3.Tundîya Li Zarokan Dibe

Tundîya li dijî zarokan wekî -êrîşa fizîkî, derûnî jî di nav da- wekî her cure destdirêjî, îhmalkarî yan mameleya xemsarî û destavêtinê tê pênasekirin. (Peymana Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî, Benda 19.). Ziman, ol, bawerî, reng, şêwaza jîyanê û çanda wan her çi be, hemû zarokên cîhanê xwedî mafê parastinê ne, dikarin bi awayekê saxlem bijîn û geş bibin û beşdarî biryaran bibin. Şîdeta li dijî zarokan; di zarokan da dibe sedema zirara laşî, civakî û derûnî. Divê zarok ji tundîya fîzîkî, zayendî, aborî û derûnî dûr bêne girtin û ji her cure destdirêjîyê bêne parastin. Divê tedbîr bên girtin ku zarok rastî şîdetê neyên û bi awayekê nerasterast bandor li wan nebe.

### 2.4. Parastina Zarokan

Ji bo parastina zarokan ya ji her cure şîdet, îhmal û destdirêjîyê divê mekanîzmayên pêşîbir, parastin û piştgirîyê bêne avakirin. Postman dîyar dike ku zaroktî serdemeka pêşketinê ya bêhempa ye û hewcedarîya zarokan bi parastin û piştgirîyeka taybetî heye (Postman, 1983). Di xalên 16 û 19an yên Peymana Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî da wisa dinivîse; “Jîyana taybetî, malbatî û mal û têkilîya zarokekî bi awayekê kêfî û bineheqî nikare were destwerdan, tu kes nikare bineheqî êrişî heysîyet û îtîbara wî bike. Mafê zarokan heye ku li hemberî destwerdan û êrîşan bi qanûnê bêne parastin.”

Parastina zarokan erka malbat/nihêrvan, civak û dewletê ye. Parastina Zarokan bi awayekê bingehîn ji çar xalan pêk tê;

- Parastina zarokan ya ji hemû xetereyên ku dibin sedema zirarê,

- Lêhûrbûna berjewendîya herî baş ya zarokan,

- Baldarîya li yekenabûna zarokî,

- Guhdana beşdarîya zarokan

Gava tundî li dijî zarokan pêk were û zarok neyên parastin, agahdarî mecbûrî ye. Xalên 98, 279 û 280yî yên Qanûna Cezaya Tirkan; xala 6an ya Qanûna Parastina Zarokan û Xala 21ê ya Qanûna Xizmetên Civakî mecbûriyeta agahdarîyê saz dike.

### 2.5. Beşdarîya Zarokan

Beşdarîya zarokan tê wateya ku zarok fikrên xwe bi azadî îfade bikin û nêrînên wan bêne hesibandin. Divê zarok rasterast beşdarî mekanîzmayên biryargirtin, hilberandin û rexnekirina mijarên ku wan eleqedar dikin, bibin. Ji bo beşdarîya watedar ya zarokan di van mekanîzmayan da, “divê sinorê temen tune be, pêvajo zelal û agahdar be, xetere nebe, zarok bi dilxwazî beşdarî çalakîyan bibe, cihêkarî neyê kirin û qonax dostê zarokan be” (Komîteya Neteweyên Yekbûyî ya li ser Mafên Zarokan, 2009:12). Beşdarbûna zarokan ji bo ku zarok nerînên xwe bibêjin û ji bo ku li ser mijarên ku wan eleqedar dikin peşvegeran/feedback wergirin giring e. Nîşaneya herî giring ya beşdarîya zarokan, peşveger in. Bi tetbîqkirina paşvegeran mirov dikare behsa beşdarîyeka tam bike.

### 2.6. Ewlehîya Zarokan

Ewlehîya zarokan parastina zarokan ya ji tundî, îstismarkirin û destdirêjîyê ye. Herweha, jîngeha fîzîkî divê ji bo zarokan ewle be. Pêdivî heye ku tedbîrên ewlehîyê werin girtin, wekî mînak divê zemîn ne şemitokî be, li derdora wan madeyên kîmyewî tune bin, lavabo û berên paqijîyê li nuqteyên wisa bin ku zarok bi hêsanî xwe bigihînine û zarok ji materyalên ku dibirin, qul dikin û dişewitînin dûr werin girtin. Hemû cihên ku zarok lê hebin divê li gor zarokan werin sêwirandin. Divê di her çalakîyê da ku ji bo zarokan were sazkirin hesabê hewcedarîyên hemû zarokan bikin.

Dema ku zarok ne di fikara îstismarkirinê da bin, dema ku nêrînên wan bêne bihîstin û destekkirin, ew xwe ewle his dikin û bi awayekê aktîf beşdarî jîyanê dibin. Divê ewlehîya zarokan li hemû dezgehên mîna dibistan, malbat, navendên civakî, rêveberîyên herêmî, dezgehên fermî û dezgehên sivîl bê parastin. Malbat, dewlet û hemû civak ji ewlekarîya zarokan berpirsyar in.
Ji bo ewlehîya zarokan ya li dezgehan;
- Divê dezgeh li ser parastina zarokan, ewlekarîya zarokan, beşdarîya zarokan hişyarîyê zêde bike û xwedî Sîyaseteka Parastina Zarokan ya berfireh û nerm be.
- Divê cihan li gor ewlehîya zarokan saz bikin û li gor ewlehîya zarokan revîze bikin.
- Divê xebatkarên komele, lijneyên rêveberîyê, endam, dilxwaz û her kesê ku bi zarokan ra dixebitin xwedî perspektîfa parastina zarokan bin û belgeya qaîdeyên tevgerê îmza bikin.
- Divê dezgeh xwedî mekanîzmayeka kesê sereke, gilî, agahdarî û bersivdanê be.

### 2.7. Rewşa Başîya Zarokan

Dema ku em li paradîgmaya nûjen ya zaroktîyê dinêrin, dibînin ku zarok ne objeyek e ku pêdivî bi parastinê heye lê subje ye. Yanî wisa tê fikirîn ku zarok ne milkê malbatê yan jî civakê/dewletê ye. Herweha pêdivîya zarokan bi parastinê heye û tê fikirîn ku divê ev hewcedarî bi alîkarî û hevkarîyê mezinan pêk werin. Ev berpirsîyarî bi awayekê berfireh di navbera dewlet û malbata zarok da tê parvekirin. Ev fikir xwe dispêre peymanekê; li gor Peymana Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî (CRC), zarok mîna mezinan kesên xwedî maf in û hin taybetmendîyên wan yên ji mezinan cuda ne.

## 3. Prensîb

• Berjewendîyên zarokan li ber çavan bigirin.
• Zarok, di wan biryaran da xwedî gotin in ku bandorê li jîyana wan dike.
• Zarok bi wekhevî dikarin xwe bigihînin hemû çalakîyan bêyî cudakarîya zayend, nijad, esl û temen.
• Pirsa ji malbatan, ya li ser prosedurên ku di derbarê pêkanîna polîtîkayê da têne destnîşankirin.
• Di wan tedbîran da ku ji bo zarokên di xeterê da ne yan jî di rewşeka dijwar da nehatine standin, hesabdan û berpirsîyarî.
• Kesên taybet yan jî qanûnî yên ku dê bi sazîya me ra bixebitin divê xetereyên parastina zarokan nas bikin û pêşî li xetereyên mihtemel bigirin.
• Zarok jî tê da kesên taybetî yan jî hiqûqî ku em dê bi wan ra bixebitin divê polîtikaya dezgeha me bizanin û bi duristî û şefafî bixebitin.
• Parastin û nepenîya daneyên şexsî.
• Di xalên pêwîst da divê ji pispor û sazîyan destek bê wergirtin.
• Şopandina sepandina Sîyaseta Parastina Zarokan û afirandina Sîyaseta Parastina Zarokan ya revîzekirî dema ku pêwîst be.

**4.Polîtîka**

- Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, komeleyeka wisa ye ku rasterast bi zarokan ra dixebite û di her çalakîya xwe da li qencîya zarokan difikire.
- Xebata xwe li ser esasê Peymana Mafên Zarokan ava dike û xwe dispêre van çar prensîbên bingehîn: berjewendîyên herî baş yên zarokan, mafê jîyan û pêşketinê û mafê beşdarbûnê.
- Dema ku bi zarokan ra dixebite, li gor ewlekarîya zarokan û çalakîyên dostane yên bi zarokan ra mekanan amade dike.
- Hem di nava rêxistinê da û hem jî li derve bi tu awayî tundîyê qebûl nake.
- Polîtîkayên ku ji bo zarokan hesas in hildiberîne û di çarçoveya KVKKê da tu agahîyan belav nake ku zarokan naparêzin. Ger destûra zarok hebe jî wêne û vîdeo nayên kişandin û dema pêwîst be bêyî destûra dêûbav parvekirin nayê kirin.
- Komeleya Berî Her Tiştî Zarok ji bo her zarokekî mekanîzmayên serîlêdanê û piştgirîyê ava dike.
- Komele bi beşdarbûna Tora Krîzê ya Zarokan, ku komeleyên din yên zarokan li Amedê jî di nav da ye, di rewşên awarte da danûstandin û piştgirîyê bilez dike û hêsan dike.
- Şêwirmendî di rewşên awarte da tê pêşkêş kirin û kesên pispor ji bo midaheleya rast dixebitin.
- Di rewşên wekî şewat, erdhej û lehîyê da raporeka komeleyê ya xetereyê heye ku ewlehîya zarokan misoger bike.
- Belgeya Ewlehî, Parastin û Beşdarîya Zarokan ya Komeleyê ji bo hemû zarokan derbasar e û yekgirtî ye.

**5. Çarçoveya Naverokê**

Kes û sazîyên ku em ji wan karûbaran distînin û hevkarîyê dikin û têkilîyên wan rasterast yan nerasterast bi zarokan ra hene -wekî xebatkarên Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, dilxwaz, pisporên beşdarî lêkolînan bûne, şêwirmend, hêsankerên atolyeyan- ji zanîn û pêkanîna prosedurên di vê mijarê da berpirsîyar in. Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, xebatên xwe li wan cihan dike ku ji bo zarokan ewle ne. Berî kargeh û civînan, hemû xetereyên mihtemel têne nirxandin û cih ji bo kêmkirina xetereyên gengaz têne saz kirin. Parvekirin li ser hesabên medyaya civakî yên komeleyê bi awayekî tên kirin ku zarok bi zelalî neyên dîtin yan jî agahîyên wan yên şexsî neyên parvekirin.

**6. Prosedurên Parastinê û Pêşîbir**

**6.1. Berpirsîyarî**

Kesê Baldar, divê ji ewlehîya zarokan berpirsîyar be û her gav nêzî zarokan be. Xebatkarên komeleyê, dilxwaz û kes û sazîyên xizmetguzarîyê werdigirin berpirsîyar in ku li gor metna polîtîkayê tevbigerin. Eger Polîtîkaya Parastin, Beşdarî û Ewlekarîyê Zarokan pêk neyê, Lijneya Rêvebir berpirsîyar e ku vî tiştî rapor bike.

**6.2. Kesê Baldar**
Komele, wekî rêxistineka ku hem ji bo zarokan hem jî rasterast bi zarokan ra dixebite, di her karî da ku bi zarokan ra têkilîyê datîne kesê baldar/fokûs dixebitîne da ku zarok bikarin xwe ewle his bikin û di her pirsgirêkê da alîkarî yan rêberîyê jê bistînin.

**6.3. Standina Karî**
Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, ji bo ku personelên ku ew dixebitîne xwedî perspektîfa parastina zarokan û wekhevîya zayendî bin, hesas e. Herweha di hemû kirînên xizmetguzarîyê da, sazî û kes divê xwedîyê heman perspektîfê bin û di warê parastina zarokan da xwedîyê zanîn û azmûnê bin. Komele, hişyar e ku xebatkar zimanekê cudaxwaz, cureperest yan jî zayendperest bikar neyne. Komele ji kes û sazîyên ku ew werdigire kar û/yan karûbar ji wan distîne dixwaze ku ew li gor Qaîdeyên Tevgerê yên Komeleya Berî Her Tiştî Zarokê (PÊVEK 1) tevbigerin.

**6.4. Polîtîkaya Kırînê**
Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, bi tu dezgeh yan jî kesan ra naxebite û berhem yan jî kar ji wan nakire ku bi îhmalkirin û destdirêjîya zarokan ve girêdayî ne:

**6.5. Parastina Agahîyên Zarokan**
Wekî sazîyeka ku ji bo zarokan û rasterast bi zarokan ra dixebite, daneyên kesane û wêneyên zarokan yên çalakî û atolyeyên me dê ji hêla komeleyê ve werin hilanîn û bi kes, sazî û rêxistinên din ra neyên parvekirin. Pejirandina hem zarok û hem jî welîyê wî/wê yê qanûnî (bi rengekê ku rûyê zarok xuya nebe) dê bi Forma Anamnezê were wergirtin ji bo parvekirina wêne û vîdeoyan li ser hesabên medyaya civakî ya Komeleya Berî Her Tiştî  Zarokê.

**7. Têkilî û Xuyabûn**
Komeleya Berî Her Tiştî Zarok navnîşanek e-nameyê, hesabên medya civakî û jimareya GSMa xwe heye ku ji bo piştgirî, hevgirtin û hevkarîyê ye; herî dereng di nava rojekê û nîv rojê da bersivê bide. Navnîşana wê di malpera wê da heye. Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, rêxistineka wisa ye ku mebesta wê ne fêde/kar ye. Ji bo domdarîya komeleyê, xebatên pêşxistina çavkanîyan yên wekî serlêdana fonan, berhevkirina bexşan û sponsorîyê têne kirin. Dema ku van xebatan dimeşîne, dikare xuyabûna sazîyên ku pê ra hevkarîyê dike û sponsorîyê werdigire pêk bîne. Komeleya Berî Her Tiştî Zarok; bi wan kesan ra hevkarîyê nake ku yan jî hevkarîyê saz nake ku di nav şîdet/tundî, îhmal û destdirêjîyê da ne û ne xwedî perspektîfa parastina zarokan in; ji ber vê yekê xuyabûna wan kes, sazî û rêxistinan pêk nayne.

**8. Mekanîzmaya Agahdarkirinê**
Ji bo berjewendîyên herî baş yên zarokan, pêşîgirtina her cure tundî, îhmalkirin û destdirêjîya li ser zarokan, bi zêdekirina hişmendîya mafên zarokan û aşkerekirina van mafan dikare pêk

were. Li vir divê mekanîzmaya îxbarê bê aktîfkirin da ku zarok ji tundîyê dûr bimîne, mafên xwe bizane û wan bi kar bîne. Karmend, dilxwaz û endamên rêveberîya Komeleya Berî Her Tiştî Zarokê xwedî perspektîfa Mafên Zarokan in. Lêbelê eger reftarek çêbibe ku mafên zarokan binpê dike, mirov dikare nivîskî yan jî devkî ji komîteya dîsîplînê ya Komeleya Berî Her Tiştî Zarokê ragihîne. Rêveberî, ji her neheqî, îhmal yan cihêkarîya ku zarok yan jî lênêrên wan di dema xebatê da dijîn agahdar dibe. Eger di vî warî da têra xwe ewle his neke, dikare e-maila info@oncecocuklar.org.tr bi kanalî bi kar bîne.

Pêvajoyên Qanûnî: Li gor xala 278an ya Qanûna Cezaya Tirkan, her kes mecbûr e ku sûcan ragihîne. Li gor xala 279an ya heman qanûnê, eger karmendekê fermî sûcekî ranegihîne, ji 6 mehan heta 2 salan bi cezayê girtîgehê tê cezakirin û li gor benda 280yî jî, eger karmendê tenduristîyê sûc ranegihîne bi salekê tê cezakirin. Agahdarkirina di warê tundîyê da ne sûcdarkirin e, ji ber vê yekê ji bo agahdarkirinê tu delîl hewce nakin; Şik yan jî zarok behsa şîdetê bike bes e. Ragihandin daxwaza nirxandin, lêkolîn, tesbîtkirin û parastina rewşa zarokan e.

Agahîyên ku dibe ku di pêvajoya agahdarkirinê da werin xwastin;

1) Agahîyên nasnameyê û cihê ku zarok lê dijî

2) Navê gumanbar, asta nêzîkbûna wî ya zarokî û hebe agahîyên nasnameya wî

3) Rewşa ku gumanê çêdike ku şîdet hatîye bikaranîn

4) Nav û agahîyên nasnameya we tên xwastin (Eger fikara ewlehîyê hebe, hûn dikarin bixwazin ku nasnameya we nepenî bimîne).

Di dema xebatê da yan jî pêwendîya bi zarokan ra, hûn guman bikin ku şîdet hatîye bikaranîn yan jî zarok behsa rewşeka weha bike hûn dikarin van tiştan bikin.

- Eger xebatkarê dezgehekê be, hûn dikarin berpirsê sazîyê agahdar bikin.
- Eger xebatkarê dezgeheka civaka sivîl be, li dijî berjewendîya zarok be yan jî çavkanîya şîdetê ne kesên pêwendîdar bin, divê dêûbav, parêzger yan mamosta bên agahdarkirin.
- Divê bûyer bi berfirehî bi zarokan neyê vegotin. Li ser îxbarê, zarok dê mijarê bi berfirehî ji sazî/pisporên pergala parastinê ra vebêje. Divê carekê bi zarokî bê gotin da ku zarok neêşe.

- Ji bo îxbar û agahdarkirinê hûn dikarin xwe bigihînin van cihan: Qereqol-Polîsê Zarokan-Jendirme, Navenda Parastina Zarokan, ELO 155 Xeta Îxbar û Hewara Polîsan û ELO 156 Xeta Jendirme, Dadgeha Zarokan ya Dozgerîya Komarê/Li cihên ku Dadgeha zarokan tune ye Dadgehên Aslîye Hiqûqê, Baro/hebin nexasim Navenda Mafên Zarokan yên Baroyê yan jî Komîsyona Mafên Zaokan, Midirtîyên Vîlayetê, Midirtîyên Navçeyê, Navendên Xizmetên Sosyal yên girêdayî Wezareta Malbat, Xebat û Xizmetên Sosyal yan jî ELO 183 Xeta Şewira Xizmetên Sosyal yên Malbat, Jin, Zarok û Seqetan, Beşên Parastina Zarokan yên Zaníngehan yan Xeta Alîkarîya Acîl ya Şîdeta Nava malbatê ya Navendên Parastina Zarokan 0 212 6569696 / 0549 656 96 96, Elo Xeta Îstîsmar û Desteka Zarokan 0 216 450 54 54

## 9. Çavkanî

**Link**


1. Peymana Mafên Zarokan ya Netewetên Yekbûyî (https://www.unicef.org/turkîye/ )

Tarîxa xwendinê: 08.01.2024

2. Qanûna Parastina Zarokan, 2005 (https://www.mevzuat.gov.tr/ )

Tarîxa xwendinê: 10.03.2024

3. ICHİLD, Rapora Karkerîya Zarokan Çi ye?, 2021 (https://ichildforchild.org/wp-content/uploads/2021/09/cocukisciliginedir.pdf )

Tarîxa xwendinê: 25.03.2024

4. Qanûna Cezayê ya Tirkan, 2004 ( https://www.mevzuat.gov.tr/ )

Tarîxa xwendinê: 10.03.2024


**Çavkanîyên Çapkirî**


1. TEZEL, A. (2002). Çocuğa yönelik şiddet. Anadolu Hemşirelik ve Sağlık Bilimleri Dergisi, 5(1).
2. Birleşmiş Milletler Çocuk Hakları Komitesi, 2009
3. Gürdal, A. D. (2013). Sosyolojinin ihmal edilen kategorisi çocuklar üzerinden çocukluk sosyolojisine ve sosyolojîye bakmak. *İş, Güç", Endüstri İlişkileri ve İnsan Kaynakları Dergisi*, *15*(4), 1-26.
4. Öztürk, H. K. (2017). Çocukluğun tarihsel gelişimi üzerine düşünceler. *Iğdır Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, (13), 253-276.
5. Postman, N. (1983). The Disappearing Child. *Educational Leadership*, *40*(6), 10-17.
6. Global Estimates, 2020, Trends and the Road Forward, *International Labour Organization and United Nations Children's Fund (2021)*
7. Sinem, U. Ğ. U. R. (2018). Geçmişten günümüze şekillenen çocukluk algısı ve çocuk yetiştirme pratikleri. Süleyman Demirel Üniversitesi Fen-Edebîyat Fakültesi Sosyal *Bilimler Dergisi*, *1*(45), 227-247.
8. WHO, "Preventing child maltreatment: *A guide to taking action and generating evidence*. Geneva: WHO," 2006.
9. Tarlabaşı Toplum Merkezi, *Çocuk Güvenliği Politikası*
10. Hayata Destek Derneği, *Çocuk Güvenliği Uygulama Rehberi*, 2023
11. İstanbul Bilgi Üniversitesi Çocuk Çalışmaları Birimi, *Çocuk Güvenliği Politikası,* 2021

## 10. Belgeyên Pêvek

### 10.1.Qaîdeyên Tevgerê

**HERTIM**

- Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, ji bilî rewşên ku pêwîst e mafên bingehîn yên kes, sazî û dezgehan bên parastin, hemû xebat, berhemên kargehan û her metnên ku diafirîne zelal, guherbar û ji her kesî ra ji bo lêkolînê vekirî ne.
- Agahîyên her kesê ku li ser înternetê yan rûbirû beşdarî çalakîyên Komeleya Berî Her Tiştî Zarok dibe, di çarçoveya KVKKyê da bi ewlehî têne hilanîn.
- Komeleya Berî Her Tiştî Zarok qebûl dike ku li hemberî fînansor, piştgirên darayî, sponsor û hemû sazîyên ku bi wan ra hevkarîyê dike û li hemberî civakê hesab bide.
- Têkilîyên Komeleya Berî Her Tiştî Zarokê yên bi kes, sazî û rêxistin û hevkarên wê ra li ser esasê duristîyê ye. Ji bilî bertîl, gendelî û/yan helwest û reftarên neqanûnî yên ku di van têkilîyan da çêdibin, ew bêalî ye.
- Di her rewşê da planan çêdike û li gor pêdivîyên zarokan û taybetmendîyên wan yên cihêreng jîngehê saz dike.
- Xebatkar, endam û rêvebirên Komeleya Berî Her Tiştî Zarokê, rêzê li cih, sînor û mafê axaftinê yên zarokan digirin.
- Materyal û tiştên zerardar ji derdora zarokan dûr dixe û ewlekarîya zarokan misoger dike.
- Destûrê dide zarokan ku her dem bikarin bibêjin "na" û nêrînên wan li ber çavan digire.
- Dema ku ew hîn dibe ku zarok di qonaxa xebatê da yan piştra rastî tundîyê tên, vê yekê ji info@oncecocuklar.org.tr ra radigihîne.

**TU CARÎ**

- Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, wekî dezgeheka ku hem rasterast bi zarokan ra hem jî ji bo zarokan kar dike, nade dû karê/fêdeyê û li gor hewcedarîyên li çavkanîyan digere.
- Komeleya Berî Her Tiştî Zarok helwesta xwe li gor bawerî, ziman û çanda mirovan dîyar nake, pirreng e û cihêkarîyê nake.
- Li gor polîtîkaya kirînê ya Komeleya Berî Her Tiştî Zarokan, komele bi kes, sazî û rêxistinên ku têkilîya wan bi tundî, îhmal û destdirêjîyê ra hebe hevkarîyê nake; ber û karûbaran nakire, şirîkîyê nake.
- Li ser daxwaza zarokan alavên taybet yên zarokan diparêze û bêyî destûr û haya zarokan bi tu awayî dest wan tiştan nade û bi kesên din ra parve nake.
-Tu kesê ku bi Komeleya Berî Her Tiştî Zarok ra têkildar be, dê bi kesên ji 18 salî biçûktir ra têkilîyeka romantîk yan cinsî daneyne, ji ber ku dê bizane ku ev destdirêjî ye û tu mazereta wê tune ye.
- Eger zarok nexwazin maç û hembêz nake; razîbûnê ava nake.
- Tev li tevgerên ku zarok û/yan malbatê dixe xetereyê nabe.

- Heta ku ji bo xebata ku tê kirin ne hewce be, dîmenên wekî wêne, vîdeo û qeydên deng nayên kişandin û li derveyî depoyên komeleyê di amûrên kesane yên kesî da agahî û dîmenên zarokan nayên parastin.
- Li zarokan derewan nake û wan manîpule nake.
- Ji derveyê têkilîya profesyonel bi zarokan ra têkilîyan danayne.
- Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, di çarçoveya Polîtîkaya Parastina Zarokan, Polîtîkaya Beşdarbûn û Ewlehîyê, Polîtîkaya Qaîdeyên Tevgerê, Polîtîkaya Dijî Cudakarîyê û Belgeya Helwesta Wekhevîya Zayendî çavê xwe li tu îhlalên sazî û dezgehan nagire ku bi komeleyê ra pêwendîdar in û îhlalan teqez radigihîne.

**10.2.Ji Bo Zarokan Forma Erêkirinê**

Ez dixwazim beşdarî bernameya ________________________________________ ya Komeleya Berî Her Tiştî Zarokê bibim. ____________________________ (Nav û paşnavê ku hêvdîtin kirîye) ji min ra got ku di kargeh/çalakîyê da wêne yan vîdeoyên min dikarin werin kişandin û axaftinên min dikarin bêne tomarkirin. Ez destûrê didim vê. Ez dizanim ku, eger ez di nava xebatê da nexwazim destûrê bidim, ez dê yekser êv daxwaza bibêjin û kesê ku ez jê ra bibêjim dê bi ya min bike. Ez hîn bûm ku ew dikarin wêneyên ku kişandine, dîmen û dengên ku tomar kirine, li ser malpera komeleyê yan jî hesabên medyaya civakî bi kar bînin. Bi şertê ku navê min nenivîsin, rûyê min bi zelalî xuya nebe û tu agahîyeka ku dikare min bixe xetereyê parve nekin ez vê yekê qebûl dikim. Ez dizanim ku Qaîdeyên Tevgerên Parastina Zarokan hene û divê hemû xebatkar li gorî wê tevbigerin. Eger ew li gor wan qaîdeyan tevnegerin yan tiştek min aciz bike, ez dizanim ku ez dikarim nêrîna xwe ji kesê baldar/fokûs ra bibêjim. Ez her tiştê ku li vir hatîne nivîsîn fam dikim.

Navê Min – Paşnavê Min:
Cihê ku lê Dimînim/Navnîşan:
Nav û Paşnavên Dêûbavê Min û Hejmara Telefonên Wan:

Dîrok:
Îmza:

**10.3.Ji Bo Mezinan Forma Erêkirinê**

Ez vasîyê________________________________ (nav û paşnavê zarok) me û dihêlim ku ew beşdarî ________________________ (navê projeyê/çalakîyê) bibe. Ez fam dikim û qebûl dikim ku, di çarçoveya vê xebatê da, dibe ku, zarokê min jî tê da, wêne-vîdeoyên wan bêne kişandin; di her gavê da dê nêrîna zarokê min bê standin; hem datayên dîtbar hem yên devkî dikarin di weşanên çapkirî û elektronîk yên pêwendîdar da bêne bikaranîn. Ez dizanim ku ez dikarim erêkirina xwe ya ji bo beşdarîya zarokê xwe ya li vê xebatê û/yan bikaranîna dîmenên wî vekişînim eger ez bifikirim ku ew ji bo zarokê min ne guncaw in. Ez dizanim ku dema ku ev tişt gişt diqewimin daneyên kesane yên zarokê min û malbata wî û daneyên ku di tevahîya xebatê da hatine berhevkirin dê di ewlehîyê da bin; ewlehîya zarokê min dê bi "Polîtîkaya Ewlehîya Zarokan," û "Qaîdeyên Tevgerê" were parastin; eger ez bifikar bibim ku îhlalek çêbûye ez dizanîm ku ez dê Mekanîzmaya Agahdarkirinê çawa bi kar bînim.

Ez her tiştê ku di vê belgeyê da hatine nivîsîn fam dikim.

Nav û Paşnavê Vasî:

Agahîyên Pêwendîyê:

Navnişan:

Dîrok:

Îmza: